

NE'MA YÛH'ENNAYE SISÎYA

Pêşgotin

Çawa ne'ma dudada usa jî ya sisîyada Yûh'enna^f xwe «berpirsiyarê civînê» h'esab dike. Evê ne'mê serwêrekî civînê, Gayosr'a dişîne. Nivîs-k'ar pesinê Gayos dide, ku ewî çawa alîk'arîya biratîyê kirîye û dibêjê ku ew h'evza xwe ji Dîyotrefîs bike, ku yekî miqabil û buxdanbêj bû.

Bi ne'mê r'uh'ê mêvanh'izîyê dike nava bawermenda, ku h'izkirin û bawerîyaf r'ast dide k'ifşê.

Serecema fikira ne'mê

Pêşgotin (1-4)

Pesinê Gayos tê dayînê (5-8)

Xirabîya Dîyotrefîs ser avê dixê (9-10)

Aminîya xwe Dîmîtrîyo tîne (11-12)

Paşgotin (13-15)

Silavkirin

1 ¹Ji berpirsiyarê civînê, Gayosê delalr'a, k'ijanî ku ez bi r'astîyê h'iz dikim.

²Delalo, ez dua dikim, ku h'emû alîyava çerxa te usa r'ast be û sih'et-qewat bî, çawa minva e'yan e ku r'uh'ê te silametîyêda ye. ³Ez gelekî şa bûm, çaxê çend bira hatin û şe'detî dan, ku tu nava

r'astîyêda amin î, çawa te pêşda r'astîyêda dijît jî. ⁴Şabûna mine jî vê mestir t'une, çaxê dibihêm ku zar'êd min nava r'astîyêda dijîn.

Pesinê Gayos tê dayînê

⁵Delalo, tu şixulê xweda amin î, çî ku bona bira dikî, h'eta ku yêd nenasr'a jî. ⁶Wana şe'detîya h'izkirina te ber civîna vir da. Tê tiştêkî qenc bikî, heger tu wan usa

ver'êkî çawa ku li Xwedê xweş tê.
⁷Çimkî ewana bona navê Mesîh
 k'etine r'ê û t'u tişt ji nebawera
 nestandine. ⁸Awa em gerekê yêd
 usa qebûl kin, ku em t'evî şixulê
 r'astîyê bin.

Diyotrefis û Dîmîtrîyo

⁹Min civînêr'a nivîsî, lê Dî-
 yotrefis ku h'iz dike ser h'emûyar'a
 be, guh nade me. ¹⁰Bona vê yekê
 gava ez bême, ezê kirêd wî gilî
 kim, ku çawa davêje me, xeyba
 me dike. Bi vê yekê jî r'azî nabe,
 ne ku t'enê bira qebûl nake, lê
 yêd ku dixwazin bira qebûl kin,
 ber wan r'adibe û wan ji civînê
 jî derdixe!

¹¹Delalo, ç'e'v nede xirabîyê,
 lê qencîyê. Ewê ku qencîyê dike,
 ji Xwedê ye, lê ewê ku xirabîyê
 dike, ewî Xwedê nedîtîye. ¹²Bo-
 na Dîmîtrîyo h'emû jî şe'detîya
 qenc didin, h'eta ku r'astî jî. Em
 jî şe'detîyê didin û tu zanî ku
 şe'detîya me r'ast e.

Silavêd axirîyê

¹³Gelek tiştêd mine nivîsarê ter'a
 hebûn, lê min nexwest ser k'axazê
 bi h'ubirê binivîsim. ¹⁴Çimkî ez
 bi wê gumanê me, ku ezê zûtirekê
 te bibînim û emê r'û bi r'û xeber
 din. ¹⁵E'dilayî li te be. Heval-hogir
 silava li te dikin. Silava yek-yek
 h'emû heval-hogira bike.